

# Agahdarî li ser aşî kirina (taman, patrome) COVID-19

Hun dikarin ji meha Kanûne sala 2020-an li Swîsreyê li dijî vîrusa COVID-19 xwe aşî bikin. Hûn li vir pirs û bersivên herî girîngên derheqê aşîbuyinê bibînin.

## Bi vî avahî em xwe diparêzin.

### Derzîkirina aşî ye tesir dike? Û derzîkirina aşî ye ewle ye?

Erê. Aşî ya li dijî vîrusa COVID-19 tesir dike. Û derzîkirina aşî ye ewledar e (pêbawerî). Ajansa Swîsreyê ya Berhemên Tedawî ya Swissmedic, ev bi baldarî lêkolîn kiriye. Tenê wê wextê aşî hat destûr kirin.

Derzîkirina aşî ye li ser gelek hezaran mirovan hatiye ceribandin. Lêkolînan nîşan diden: Aşî tesir dike. Û derzîkirina aşî ye ewledar e. Herweha ji bo mirovên pîr û kal û mirovên bi nexweşî.

Derzîkirina aşî ye rêberiyê sedemê bandorên pir giran nake. Ya ku lêkolînan heta niha nîşan daye, ev e. Swissmedic şopandina ewlehî û bandora (tesîrên) derzîlêdanê didomîne.

**Gring:** Xetera (rîska) bandorên cidî yê piştî derzîkirina aşî ye pir hindik e. Piştê ketina koronavirusê xetera bi nexweşîya giran pir zêdetirê. Ji ber vê yekê Daîreya Tenduristiya Gel a Federal (BAG) ji bo hin kesan derzîkirina aşî ye pêşniyar dike.

### Divê kî gere xwe bide aşî kirin?

Li gore BAG, divê mirovên jêrîn hatiye jimartin xwe aşî bikin:

1. Mirovên bi xetere taybetî, wekî mirovên pîr û kal û mirovên bi nexweşî.  
Gring: Jinên ducanî di nav mirovên bi xetere taybetî da ne. Lê belê hûn gere aşî nebin.
2. Karmendên nexweşxane û aramxane (malên teqawidbûnê, kal û ü pîr), ev e têkiliya wan bi nexweşan ra heye. Û kesên ku mirovên bi xetere taybetî lêdêrîn an derman dikin.
3. Kesên ku bi mirovên bi xetere taybetî di nava maleyekî jiyar dike.
4. Niştecihên li cihên kar, aramxanê û komên rûniştgehên ku xetera enfeksiyonê bi taybetî zêde ye. Û herwîha karmendên cihên kar, aramxanê û komên rûniştgeh.
5. Her mezin ê ku dixwaze xwe bide aşî kirin:

Kesên ku bi nexweşîya COVID-19 berê da ketin, dikarin xwe bidin aşî kirin. Lêbelê, hûn gere xwe sê mehan piştî enfeksiyonê bidin aşî kirin.

**Gring:** We tayê girtiyê? Hûn nexweşin? Hûn xwe ne baş hîs dikin? An hûn li benda encama testa korona ne? An hûn di tecrîdê da ne an di karantînê da ne? Wê wextê derzîkirina aşî ye nîha nekin. Hevdîtina ji bo derzîlêdanê taloq bikin (biguherîn). Di demekî zûda derzîlêdana aşî ye bikin, heke ku ev gengaz e.

### Kî dibe xwe derzîkirina aşî ye neke?

BAG derzîkirina aşî ye ji kesên jêrîn ra ra pêşniyar (tewsiye) nake:

- Mirovên ku alerjiyê giran ji her beşek derziyê heye (nemaze polîetilen glîkol (PEG))
- Jinên ducanî. Heta vî wextê lêkolînên derzîlêdana jinên ducanî tune.  
Ji ber vê yekê em nîzanîn, ku derzîkirin çawa bandor li ser ducaniyê dike. An li ser zaroka nebûyê.
- Zarok û ciwanên di binê 16 salî da. Heta vî wextê lêkolînên derzîlêdana kesên binê 16 salî da tune. Ji ber vê yekê em nîzanîn, ku derzîkirin çawa bandor li ser zarok û ciwanên di binê 16 salî da dike



### **Li ku û kengî hûn dikarin xwe aşî bikin?**

Ji bo derzîkirina aşî ye parêzgeh (Kanton) berpîrsîyarê. Agahdariya li ser derzîkirina li parêzgeh a St.Gallen, hûn li [www.sg.ch](http://www.sg.ch) dibînin. Her weha hûn dikarin ji bijîşk tenduristiyê jî bipîrsin. An hûn dikarin li dermanxanê bipîrsin.

### **Derzîkirin aşî ye çawa bi kar tê?**

Hûn li ser milê xweyê jorîn tene derzîkirin.

### **Çend caran hewce ye ku hûn aşî bibin?**

Hûn hewceyê 2 aşî ya ne. Divê ku hûn piştê derzîkirina 1. (yekêmin), çar hefteyan dura derzîkirina 2. (duyêmin) bikin.

**Gring:** Herdu aşî ya bikin. Tenê vî wextê hûn bi gengaz tene parastin.

### **Derzîkirina aşî ye çawa diparêze?**

Aşî alîkariya laşê we dike, ku li dijî vîrusê biparêze. Laşê (bedena) we parastinek li dijî vîrusa COVID-19 dide avakirinê. Ji bo vê yekê laşê we pîwîstê çend hefteyan.

Piştê aşî ya 2. bi qasî 1 heftekî dura, laşê we parastina li dijî vîrusa COVID-19 çêdike.

Ji vî wextê şunda xeter pir piçûk e bi COVID-19 nexweş bekewin.

**Gring:** Piştî ku hûn hatin aşî kirin, wan rêzikan berdewam bişopînin: Destên xwe bişon. Maskê (rûpoş) bi kar binîn. Ji hev du dûr bimînin. Ji bo ku hinêk kes disa dikarin COVID-19 bistînin, tevî ku ew aşî binbin jî. Lê pir caran, mirovên hatiye derzîkirin, giranî nexweş nakevin.

Hûn agahdarî ye bêtir derheqê bandora derzîlêdanê dixwazin? Wê hingê li ser malperê me [www.bag-coronavirus.ch](http://www.bag-coronavirus.ch)/mrna binihêrin.

### **Derzîkirina aşî ye çiqas diparêze?**

Ew vî ya niha nizanin. Hilberînerên (berhemdêr) derziyê vê yekê lêkolîn dikin. Dibe ku BAG dê di demek da derzîlêdana 3. (sêyemîn) pêşniyar bike.

### **Hûn dikarin bi derzîlêdanê COVID-19 bistînin?**

Na. Hûn nikarin bi derzîlêdana COVID-19 bistînin. Di derziya aşî da vîrusên korona tune.

### **Bandorên alî (tesîrên alî) ye derzîlêdana aşî ye hene?**

Dive ku di her derzîlêdana dikare bandorên alî (nerazîbûnê) hebe. Pir caran bandoren alî gelek bêhêz e. Û pir caran bandoren alî zû bi dawî dibin.

### **Çi bandorên alî dikarin hebin?**

Van bandoren alî bi gelemperî hene:

- Cihê derzîlêdanê sor, dêşê an wêrim dibe.
- Eşa serî
- Bêxewbûn
- Eşa masûlk û movikan (lemlate û hestî)
- Nîşanên gelemperî yên wekî girtina serma an taya sivik

Bandoren alî nîşan dikin ku laşê we li dijî vîrusa COVID-19 parastin çêdike (bi kar tinê).



Bandoren alî ye giran pir kê m in. Ji bandorên cidî yê giran yek ji wan, wekî mînak reaksiyonek alerjîk ya dijwarin. Ew piştê derzîlêdanê çêdibe, ku werimandin, sorbûn, xurîn an kurtbûna bîhna (nefesê biçîke) heye.

Nîşaneyên we yê wusa hene? Wê hingê ji kerema xwe zûtîrek bi bijîşkê (dixtorê) xwe re biaxivin (bipeyivin)!

### **Bandorên alî çiqas dikarin bidominê?**

Bi gelemperî bandorên alî piştî çend rojan derbas dibin. Piştî hefteyek bandorên wê ye alî hîna jî henîn? An jî bandorên alî xirabtir dibin? An hûn şayîsî (endişe) dikin? Wî wextê bi bijîşkê xwe re biaxivin.

### **Divê hûn piştê derzîlêdana aşî ye çi bikin?**

We aşî ya yekê mîn (1.) kir? Wê hingê ji kerema xwe zûtîrek (tavilê) ji bo aşî ya duyê mîn (2.) randevûyek bigirin. Divê ku hûn piştê derzîkirina yekê mîn, çar hefteyan dura derzîkirina duyê mîn bikin.

**Gring:** Piştî ku hûn hatin aşî kirin, wan rêzikan berdewam bişopînin: Destên xwe bişon. Maskê (rûpoş) bi kar binîn. Ji hev du dûr bimînin.

### **Hûn hatinê aşîkirin. Hûn dikarin mirovên din bi COVID-19 derbasbikin (enfeksiyon bikin)?**

Ew vî ya niha nizanin. Lêbelê, gengaz e ku hûn tevî derzîlêdana aşî ye enfeksiyona COVID 19 bigirin. Bi ihtîmalek mezin, hûn ê nexweşî nakevin. An jî hûn tenê nîşanên sivik dibînin. Lê dibe ku hûn dikarin mirovên din bi vîrusê derbaskin (vegîrînin). Ji ber vî yekê piştî ku hûn hatin aşî kirin, wan rêzikan berdewam bişopînin: Destên xwe bişon. Maskê (rûpoş) bi kar binîn. Jj hev du dûr bimînin.

### **Divê hûn heqê (pere, dirav) derzîlêdanê bidin?**

Na. Aşî belaş e.

### **Derzîlêdana aşî ye bi dilxwazî ye?**

Erê. Aşî li Swîsreyê bi dilxwazî ye.

### **Hûn di derbarê aşî ya COVID-19 de bêtir agahdarî dixwazin?**

Hûn dikarin li ser malpera Daîreya Tenduristiya Giştî ya Federal bêtir agahdariyê bibînin: [www.bag-coronavirus.ch/impfung](http://www.bag-coronavirus.ch/impfung). Her weha hûn dikarin bang li Infoline Federal bikin: 058 377 88 92.

(Infoline: Navenda agahdariyê ku bi têlêfonê tê gihîştin)

An jî hûn dikarin ji bijîşkê xwe bipirsin.

Her weha hûn dikarin bêtir agahdarî ji dermanxanê xwe bigirin.

